Peyam
MALPERA NIVÎSKARÊN KURD E

ROLÊ ROJNAMEVANAN DI CIVAKÊ DE ÇIYE…?

Hozan Efrînî

Li gor felsefeya rojnamegeriye û li gor diyalektîka ragihandin û agahdariyan, dibe ku her kesek pabendiya xwe bi van xalên jêrîn bike û di warê piratîkî de bi cîbike.

- Agahdarî kirin û hoşyar kirina welatiyan. Li gor rewş û pêwîstiyên danustandinên ku di nava civakê de tê peyrewkirin.
  Lê mixabin ev kar û xebat gelek caran li gor xwestekên teke kesayetiyan û bi awayekî teng pêk tê. Bi mînak, her agahiyek, dibe li gor xwesteka desthilatdaran an jî xanedanên mezin bin, ên ku di nava civakê de nayên pejirandin û ji aliyê xelkê ve jî, bê rewişt û ne pak tên dîtin.
  Agahî, gelek caran bi şêwazeke ne rast tên weşandin û ew jî dibe sedemên ku bê beweriya welatiyan li hember rojnamevanan çêdibin û pêşdikevin. Ji ber ku di rastiya wan agahiyan de, mebest û armancên cur bi cur hene û dûrin ji rastiya civakê.
  Wê demê, civak dikeve nava rewşeke cuda û bê bawerî lib a tê pêşxistin û hinik hindik cih û mitmaneya wana bi rojnamevanan lawez dibe û rolên wan di nava civakê de namîne, ev jî bandoreke ne rast û ne pak jib o pêşveçûna çespandina rastiya kar û barên desthilata çaran çêdike.
  Lê belê, jib o pêşxistina têgeha hoşyar kirinê, ev erkeke jib o hemû rojnamevan û rewşenbîrekî civakperwere. Pêwîste her yek xwe bi xwediyê wê erkê bizane û xwedî lê derkeve. Lê mixabin hin caran heye ku rojnamevan anjî ên xwe bi rojnamevan didin nasîn, ji bilî belav kirin û weşandina nûçe û hewalên ku destdirêjiya pîroziyên civakê dikin, ti tiştên din nakin, ew jî, mina nexweşiyeke bê dermane, ew kes pê ketine û jê venabin, weke nexweşiya zaletanê ye. Ev nêzîk bûn, di demên dahatî de, dê gelek nexweşiyên cor bi cor derdixîne holê.
  Bo nimûne, ev nexweşî di nava raghandin û malperên me ên elektironî de gelek pêşkeftiye, eger hunermendek an jî nivîskarek an jî rojnamevanek ne li gor min be an li gor rêbaza partiya min be, edibe ku ez wî kesî bi awayekî zirav bixime nava cihaneke teşhîrwarî û siviktiyê pê bikim û li ber çavên civakê neşîrîn bidim xuyakirin, da ku ez bikaribim xwe ji dijberên wan kesan ve nêzîk bikim û xwe bi dim jiyankirin. Ev tê wê wateyê ku wî kesî ku bi kirasê rojnamevaniyiyê kar dike, mebest û armanca wî xizmet kirin û pêşxistina rolekî berçav jib o çespandina rastiya rola rojnamevanan di civakê de nîne û bê armance, ew kesê ku bê armanc be dê di karên xwe de serkeftî nebe û dê her dem binkeftî be.
- Dibe ku raportên zelal û gelek bi hevseng pêşkêş bike. Da ku bandore bixe ser cemewer û ronahîkirineka berfereh bide ser civakê.wê demê civak jî dê xwediyê li rojnamevanan derkeve.

Eger em çavekî li rewşa raport û rêportajan bikin, bi taybet ên ku di raghandinên me de tên pêşxistin, dê gelek tiştên sêremer derkevin holê. Ji ber ku ta niha jî, em neghştine wan têgehên

rojnamegeriya azad û bê alî, piraniya rojname û kovar û kanalên raghandinê li her çar aliyên Kurdistanê de, bê alî nînin, sedemên herî serekî, pirsgirêkên aborîn e.

- Şirovekirina encamên girîng û guncaw. Da ku tev endam û çîn û jîwerên civakê bikaribin hêza bawerî û mitmaneyiyê bi dest bixin û bibin bi alîgirên desthilata çaran.

  Ev yek jirastiyên rojnamevanan dide xuyakirinê, eger rojnamenivîs bi vê rengî kar neke û li gor xwe kar bike, wê demê ewê mitmaneya gel û cemewer ji dest bide, gel ti carî dê wan kesana nepejrînin û ji hewal û agahiyên wana Razî nebin.

  Ji jib o wê yekê, dibe her rojnamenivîsek hewil bide bi dilsozî û pirofêsênal di warên şirovekirina encamên girîng de zirav û zelal nêzîketiya xwe nîşan bide.

  Ji ber ku xebata rojamegeriyê gelek nazdar û hestyare, dibe ku her xebat karek, gelek bi başî encamên wê bide şirovekirin û bi civakê bide pejirandin, ne bi fêlan belko bi rastiyan.

- Dibe her dem Mîna kenaleke têkeliyan bixebite. Da ku bikaribe agahî û nûçeyên bi cih û mitmane pêkirî peyda bike û bibe bi xwediyê gelek jêder ên rastewxwe di nava civakê de, ev jî dê şêniyên nava civakê bi giştî qezenc bike.

  Peydakirina nûçe û zanyariyên pêwîst, gelek bi zehmetî û hestyarî tên hole.

  Eger mirov bixwaze bi rastî di warên rojnamegeriyê de bixebite dibe ku di serî de dest bi darijtina pilannameyeke cedi û bi cî bike.

  Dibe ku xwe d nava civakê de xweşewîst bike, razîbûa gel û sazî û cih û kardarên cor e cor bi dest bixîne, da ko bi be weke kanaleke têkeliyan û bi wê awayî tê keve nava xebatê û di wê demê de, dê mitmenaya gel jî bi dest bixîne.

- Têkestkirin li ser wê rastiyê ku wan kesên girîng berpirsyaretî dikeve ser milên wana.

  Di hemû derê de û di hemû demê de dibe xebatkar û karmend û her kesên ku di warên rojnamevaniyê de dixebite, gelek bi başîbizanibin ku berpirsiyaretiya herî mezin dikeve sr milên wan kesên ku girîngin û di nava civakê de xuyakirî ne, ji bo wê jî, xebata rojnamevaniê gelek qoral û yasa û destûrên xwe ên cuda cuda hene.

  Ji bo ku mirov bikaribe di nava xebatê rojnamegeriyê de bi serkeftî û serfirazî berdewam be, di be ku Têkest bike li ser wê rastiyê ku wan kesên girîng herdem berpirsyaretî dikeve ser milên wana. Di her kar û xebatekê de lawezî û zehmetî û diwarî derdikevin hole, di wê demê de xebatkar neçare ku bibe xwedî rol û bi taybet rojnamevan ku weke giyan û çav û nîşana civakê ye dibe ku rolekî mezintir bibîne û bi erkên xwe bizane. Karên rojnamevaniyê ne kareke esane, rojnamevan bi pênûsa xwe di nava şoreşê de ye herdem di nava metirsiyên koştin û ji nav birinê ye, jib o wê yekê dibe ku parestina xwe bide pêş lê gereke jib o bicîkirina erkên xwe ên ku di xizmetê gelê wî de ne, pêwîste herdem amade be jib o fedakarî û xwe bextkirinê. 30-05-2010

Hozan Xelîl Efrînî

Endamê Kara Ya Sendîkaya Rojnamevanên Kurdistan